



EuroKurd Human Rights-EHR
Hejmar: 13, Nîsan 2009-Stockholm

Rapor:

**Hevpeyvîn bi pîlotê şer Tariq Ramadan
re li ser qirkirina **Helebceyê****

Gabar Çiyan – Gary Trotter

Pêşgotin

Pîlot Tariq Ramadan di dema Sadam Hisêyn de pîlotê şer bû. Di destpêka 2005 an de ji aliyê Hêza Ewlekariya Herêma Kurdistanê- Asayisê ve hatibû girtin. Bi beşdarbûna bombebarankirina Helebceyê hatibû suçdarîkirin. Ramadan demek dirêj li zindana Silêymaniyê girtî ma. Di dawiya 2008 an de, di dema tedawiyê de ji hepsê bazda. Tariq Ramadan mehkum e û lê digerin.

EuroKurd Human Rights herdem rastî aniye zimên. Pirsê mafê mirovan û demokrasiyê li Kurdistanê ciddî digire. Pê bawer e ku rexneya dostanî dikarê baştir bibe alîkarê netewa me. Polîtîka EHR ya mafê mirovan li ser hezkirina mirovan û parastina mafê wan ava bûye.

Pirsê qatîlên Helebceyê û ya Tariq gelek caran bûye cihê niqaşê. Hikumeta Herêma û Asayisê dîtina xwe li ser Ramazan anîne zimên. Asayis, Ramazan girtî û da ber îşkencê. Tariq, mecala qisekirin û xweparastinê çî caran bi dest nexist. Herdem li kesekî geriya ku dîtina xwe bîne zimên. Qala xwe bike, rola xwe bike.

Tariq Ramazan xetera ku bê girtin jî da ber çavê xwe û têkilî bi EuroKurd Human Rights ê re danî.

Rojnemavan Gabar Çiyan û rojnamevanê inglîzî Gary Trotter hevpeyvîna pê re hatiye kirin, pêşkêşî we dikin. Spas jibo hevkarî û dostaniya Gary.

Spas jibo baweriya we

EuroKurd Human Rights

- Li gorî Asayîşê navê te Muhamed Tariq Ramadan e. Di dîploma te de Ibrahim Tariq Ramadan derbas dibe. Medîa jî bi "Tariq Ramadan Baker Allawî" te nas dike. Dîtina te çi ye?

Navê min Tariq Ibrahim Ramadan Bakr Alazzawî ye.

- Qala xwe, ya malbat, xwendin û nasnameya xwe bike...

1958 an de li Kerkukê çêbûm. Ez iraqî me. Ji eşîreta Alazzawî me. Ji turkmenê nijad ereb im. Ez zewicî me û sê zarokên min hene.

Min, di sala 1964 de dibistana bingehîn ya Al-Jumhurreya, 70 de ya navîn û 74 de lîse xwend. Di 1978 de li Tikritê dest bi kolêja hêzên esmanî (perwerdeya pîlotbûyînê) kir.

Di serê sala 1981 î de dîplomeya tegmen (serleşker) pîlotiyê bi dest xist. Ji bo bûna pîlotê seyidvan, bi balafirên Mig 21 PFM, Mig 21 BIZ ê, li navenda hêza esmanî ya 27 an, SON 11 ê perwerdeya êrîşa biroj xwend. Paşê jî ji bo karanîna balafiran di reşahiya êvaran de, perwerde girt û bûm pîlotê seyidvan.

Di nivê sala 1982 an de hêza ma ya esmanî bar kir û li balafirgeha Al Rasheed li Baxdayê bi cî bû. Hêza esmanî, ez di dawiya sala 1982 an de ji bo perwerdeya li ser balafirên Mirage F1 ê şandim Fransayê. Di nîsana 1983 an de xwendina min bi dawî hat û min di nava hêza 89 F1 li Al-qayyara ku li Balafirgeha Sadam e dest bi wezîfê kir. Du hêzên cewaz li wir bi cî bûbûn: SON/89 ji bo seyidvaniya ezmanî, SON / 79 û Mirage F1 ji bo hêzên esmanî yê raçavkirin /casustiyê.

Di dawiya 1984 an di dema tatbîqata li çola Al Qayyara agir bi balafira min ket û ez mecbur mam ku wê bi cî bihêlim. Laşê min şewitî û ez seqet bûm. Ji ber êş û brînên min, ji firandina aktîf ya balafiran hatim durxistin.

Tevayê sala 1985 an ji ber nexweşiya xwe durî kar mam. Min wê demê xwest ku min teqawît bikin, lê xwestina min nehate pejirandin.

Belê, rola min ya pîlotbûna aktîv bi wê qezayê bi dawî hatibû, lê dîsa jî li dibistana FIS ê li Baxdayê wezîfeya mamosteyê dane min. Piştî perwerdeya instruktoriya balafiran, di havîna 1987 an bûm mamosteyê xwendevanên balafirên sivik (weke Bravo, Tucano, L29, L39).

Xebata min ya peryoda adara 1988 an di deftera min ya raporê de eşkere xuyanî dike. Di dema 17-18 ê adarê de ku êrîş birin ser Helebceyê, bikaranîna balafiran ji aliyê min ve ne mumkun bû. Ji xwe di dawiya hefteyê, û rojên sor de kesên mîna min karên firandinê nedikir.

1991 de dewltê fêhm kir ku, ez ê ji bo rejîma Sadam Hisêyn, qet nekevim dijberî turkmen û kurdan. Lewma destê min ji xebata firandina balafiran bi tevayî kişandin. Li Kerkukê karê memurtiyê dane min. Di destpêka 1996 an de hatim teqawîtkirin û çî têkiliya min bi hêza esmanî re nema.

Min dest bi xebata rojnamevaniyê kir û nivîsên min di rojnameyên herêmî de belav dibûn. Giraniya nivîsan li ser pirsên olî, însanî, rûhî û filozofiyê bûn. Rêvebiriya bilind ya Iraqê ji min xwest ku ez nivîsên erênî ku Saddam bilind dike, binivîsînim. Nepejirandina xwestekên wan dikarîbû rewşa min xirab bike, jiyana min têxe xeterê. Ji bo ku nivîsên wisa belav nekim, min giranî da xebata bi kovara Heyva Sor û rojnameya "Parapsykoloji".

Bi têkçûna Sadamî ez jî kêfxweş bûm. Min li şîrketa Ingilîzî ya ewlekariyê ERINYS li Northern Oil Companyê, bajarê Kerkukê dest bi xebatê kir. Di îlona 2004 an de, ji şîrketa Parsonsê ji bo paqijiya balafirgeha Kerkukê kar dane min. Roja 3 sibata 2005 an, li balafirgehê ji aliyê Asayisê hatim binçavkirin...

Beş 1 Binçavkirin- girtin

- Tu çi demê û li çi deverê hatibû binçavkirin, girtin?

Dema ji derketina kar li Kerkukê, di 3 sibata 2005 an de hatim girtin.

- Pêşî te birin çi deverê?

Serleşkerê emerîkî Shane ez girtim û teslîmî Asayişê kirim. Mecalê dîtin û qisekirinê hatin rakirin û ez bi zorê xistim bagaja timobîlekê. Di zindana Silêmaniyê, di hucreyek 2m x 1m de hatim îzolekirin.

- Hayê malbata te ji girtina te hebû? Çi demê pê hisiyar?

Hayê malbata min ji buyera girtinê tunebû. Dema ji kar nehatim malê, endamên malbatê zêde tirsîyan. Wan hewil da ku min peyde bikin û ji nasan pirsê min kirin. Polîsê Iraqê li ser wundabûna min hatin agehdarkirin ku li min bigerin. Lawê min çû balafirgeha Kerkûkê û ji hêzên emerîkî pirsîyar kirin. Serleşker Shane wisa bersiv dabû: Hayê me ji bavê te tune ye. Tu careke din were wir, em ê te bidin girtin.

Di wê demê de malbata min xemgîn bûbûn û tirs dilê wan de bû. Wan wisa bawer dikir ku ez ji aliyê terorîstan ve hatime revandin û kûştin. Piştî çend hefteyên din ku çî tişt bidest nexistin, gihîştin wê encamê ku ez hatime kuştin.

Min bi xwe jî texmîn dikir ku çiqasî malbata min di rewşek xirab de ye û min mîna dînan dixwest nuçeyekî bighêjînim malbata xwe. Lê xwestina min ji aliyê asayişê dihate red kirin.

Di 29 gulana 2005 an de kesek bi navê Nikolas ji Xaç Sor hat serdana min. Bi rêya wî, min dikarî notekê bighêjînim malbata xwe. Kurtenameya min di 5 Hezîranê de gihandin malbata min.

- Tu bi çi sucî dihate suçdarîkirin?

Ez wek pîlotekî suçdar ku Helebce bomberan kiriye dihatim nîşandan. Suçdarîkirina mirovan bi sucekî û dadgehkirina kesekî ji ber sucekê du tiştên cewaz in. Pirs ji tevahiha Iraqê re giring e û divê pirs li gorî normên hiqûqî bê çareserkin.

Min çi dokument li ser pirsê ku suçdar bibim nedaye Asayişê. Asayiş bi xwe jî nikare sucek wisa ispat bike, nekiriye. Tenê îfadeya min ya di dema îşkencekirinê de hatiye girtin, di destê wan de ye.

- Îşkence li te hat kirin, an na? Çi cureyên îşkence li hemberî te hate karanîn?

Belê, bi pêhn û kulman li min xistin. Ji ber kulm û pêhnên nêzî dilê xwe, dilê min pir êşîya û ez bêhiş ketim erdê. Di dema îfadeyê de, çavên min dihatin girtin û dest ji dawiyê ve dihatin girêdan. Ev îşkence bi navê skorpion dihate navkirin.

Di dema îfadeyê de du-sê kes ji Asayîşê li wir amade bûn. Di destê wan de qablo û jopên hesinî hebû. Bi emrê rêvebir êrîş dihanîn ser min. Îşkenceya herî bi êş ew bû ku, bi kabloyan li pêçiyên (tilî) min dixistin. Bi rêya dengê muzîka bilind ya kurdî, ji saet 7.00 an hetanî 23.00 an ji aliyê rûhî ve tesîrek xirab li me dikirin.

- Navê wan kesên îfadeya te girtin, tê bîra te?

Belê, serleşker Nasir û Sîrwan ji girtina îfadeyan berpirsiyar bûn.

- Tu çiqasî di girtîgeh / zindanê hiştin?

Ez di 3 sibata 2005 an de hatim girtin û di 28 cotmeha 2007 an de hatim berdan. Bi giştî 996 rojên min di zindanê de derbas bûn.

- Navê zindanên tu tê de girtî mabû çi bûn?

Pêşî di zindana Gushti li Silêymaniyê bûm. Ji 3 sibata 2005 an hetanî 6 hezîrana 2005 an di hucreyê de îzolekirî bûm. Di destpêka 2007 an de ez şandim zindana Kani Gomayê.

- Helwesta Asayîşê li hemberî mehkûman çawa bû û rêvebiriya zindanan çawa rêve dibirin?

Metodên Asayîşê li dijî girtiyan bi giştî ji hişkîya bê sînor, tirsandin, îşkence û hovîtiyê pêk tê. Beşek ji wan baş bûn û ji kirinên Asayîşê yên neînsanî nerazî bûn. Lê wan jî ji tirs nikarîbûn dengên xwe bilind bikin.

Beşek ji girtiyên ji Kerkukê anîn zimên ku, hejmarek girtîgehên cihên xwe ne eşkere li Kerkûkê hene. Li Kara Henjeer û Cham Chamalê ne. Kesên girtî piştî çend hefteyan li zindana Silêymaniyê bi cî dikin. Li gorî zaniyariyên Xaça Sor li Herêma Kurdistanê 20 girtîgehên cihên wan ne eşkere hene.

- Qala rewşa zindanan ji awira sihet, xwarinû vexwarin û mecalên paqijiyê bike...

Di zindanan de girtî di eywan û hucreyên îzolekirinê de tên bi cî kirin. Firehbûna hucreyan 90 cm x 190 cm ne. Çile pir cemidî, havînan ji germa dişewitin. Weke ku min qal kir, ez demek dirêj di hucreyê de hatim bi cî kirin. Ji ber sermayê têra xwe êşiyam. Girtiyên havînan di hucreyan de girtî bûn, qala germbûn, bêhewabûn û bêhna genîbûnê dikirin. Wan bi xwe jî bawer nedikir ku çawa li ser nigan in û dijîn.

Eywan qirêjî ne û dilê mirovî jê dixele. Eywana hejmara 1 ê, firehbûna xwe 5m x 8.5m ye. 120 mehkûm di 42 kvadratmetreyî de dimînin. Anku di her kvadrat metreyekî de 3 mehkûm dijîn. Girtî bi ser hev de tene guvaştin. Rûniştina li erdê ne mumkûn e. Xew di nava kabusan de pêk tê.

Laşê mirovan şev û rojê di nava xwedanê de dimîne. Ji ber mirov bi ser hev re hatine pelçiqandin, bêhna xwedanê têkilav dibe û bêhnek genî bi xwe re peyde dike. Hejmarek bilind ji girtiyan nexweşiya xwe ya cild (çerm) heye. Gelek kes ji ber bêhewabûnê dihêşin.

Ji heftê carekê mecalê mirov û xwe şuştinê, anku duşê heye. Piştî rojekî jî em cilên xwe dişon. Cihê ziwakirinê tune ye, mirov cilan datîne ser hesinên hepsê yên zingargirtî. Zingara salan nexweşiyên cildî peyde dike.

Du tuwaletên qirjî hebû. Pêwîstiya tuwaletê bi dorê dihate kirin û mirov bi qasî 15-20 deqîqeyan li benda dorê dima.

Eywanek servekirî hebû. Mafê mirov û gerê, rojê bi qasî 20 deqîqeyan hatibû sînorkirin. Gera me û hewa paqij ya mehkuma bi wê demê hatibû sînorkirin.

Zêdeyî 550 mehkuman li hepsa Asayiş ya navendî hebû. Lê doktorek wir tunebû. Tenê sixtyek hebû. Navê wî Kamîran bû û di navbêra 8.00-02.00 an dixebitî. Derman dida nexweşan, lê bi xwe jî li ser bandora wan dermanan ne xwedî zaniyarî bû.

Kalîteya xwarinê pir xirab bû û xwarin têra mirovan nedikir. Li gorî zaniyariyên belav dibûn, kesê ku bi çêkirina xwarina zindanê wazîfedar bû her serê kesek mehkum 11 dolarên emerîkî digirt. Lê di pratîkê de mesrefa her kesekî di bin 2 dolaran de bû.

Xwediyê acentayê berpirsiyar kesek bi navê Mam Elî bû. Mam Elî bi rêya diziya mafê mehkuman rojê bi qasî 5000 dolarên emerîkî qezenc dikir. Mehkûm ji bo ku ji birçîbûn û tîbûnê nemirin, ji butîka hepsê xwarin û vexwarin dikirîn. Mam Elî xwediyê butîka hepsê bû. Û bi şîrîkatiya kesên di Asayîşê de dizî û sextekariya xwe didomand, pê dewlemend dibûn.

Girtina mehkûman bi dirêjî û qezenckirina pera gelek caran dibûn sedem ku mehkûm neyên azadkirin û di bin çavan de bêne hiştin.

Av têra mehkuman nake. Ji bîrekê berdidin bermîlên mezin. Di gulana 2007 an de ji ber ku pompekîrîna avê daxistin ji heftê carekê, mehkuman serî hildabû.

- Mafê xweparastin û girtina awuqatan çawa ye?

Na, çi caran mafê xweparastin, anjî girtina awuqat ne mumkun e.

Di 2005 an de îfadeya min ji aliyê du dadgêran ve li dadgeha bilind ya Iraqê li hepsa Silêmaniyê hate girtin. Wan bi rêya tehdîta îşkencê înzeya min girtin ku pêwîstiya min bi çi ewuqatan tune ye.

Malbata min xwest ku ji min re ewuqatekî bigirin. Lê ji ber tirsê kuştinê çi ewuqatan nexwest daweya min bigire.

Ann Clwyd ku bi xwe parlamenter e û endamê taybetî yê serokwezîrê Ingilîztanê ji bo raçavkirina mafê mirovan li Iraqê ye û bi konsolosê Brîtanayê li Iraqê dixebite, gelek caran li ser pirsê mafê min yê hiqûqî pirsên xwe gihandin rêvebirên IKDP û PUK ê. Lê ji hevkarîyê re ne vekirî bûn.

Her dema min hewil da ku pirsê bi rêyên hiqûqî bighêje encamekê, rê li ber min bi şeweyekî xirab hate girtin. Pirs ne tenê ya min e. Pirsgerêk metodên Asayîşê yê bêqanûnî û neînsanî ne. Îro jî ev trajedî didome û tiştên pêk dihênin eybek mezin e ji bo tevayê Iraqê.

- Mehkumên ji Ewropayê di destê asayîşê, di hepsan de hene an na?

Belê, di destê wan de hejmarek girtiyên biyanî hene. Weke mîsal: Awat Salahedîn ku hemwelatîyê Swêdê ye û 16 salî bû, di zindana Silêmaniyê de bû. Di gulana 2006 an hatibû girtin. Ew li Swêdê hatibû dinyê û li wir mezin bûbû. Ji bo serdana dapîra xwe hatibû Helebceyê. Di dema kontrola Asayîşê hatibû girtin.

Asayîşê sedema serdana wî bo Helebceyê pirs kiribû. Wî bi henekî, xeletiyek kir û got ku, wî navê hêza Ansar el Islam bihîstiye û dixwaze ji devê wan guhdarî bike bê armanca wan çiyê.

Piştî qisekirinê, wî digirin û didin ber îşkencê. Jê dixwazin ku li xwe mukir were û bêje ku ew endamê Ansar el Islam e. Ew jî bi derewan li xwe mukir hatibû. Piştê konsolosê Swêdê mudaxele kir. Mudaxeleya çend caran, wî ji destê Asayîşê rizgar kiribû...

- Navê kesên wezîfedar ku îşkencê û muameleyên nebaş li hemberî mehkuman dikin, tê bîra te?

Kesên ku sereokatiya îşkencê dikin ev in:

Col Nasir, serokê beşa siyasî di navenda Asayîşê de û Serokê duwê yê giştî yê Asayîşê

Col Hama Hasily, serokê Asayîşê yê şaxa polîtîk li Kerkûkê

Col Ehmed, alîkarê Col Hama ye

Û kesên alîkarên wan...

Beş: 2, Li ser meslekê te û qirkirina Helebceyê

- Tu pîlotê şer e an na? te çend salan ev kar domand?

Ez di dema şerê Iraq û Îranê de weke pîlotê balafirên seyidvan wezîfedar bûm (1981-84). Rola min ew bû ez li balafirên neyaran guhdarî bikim û wan ji ser esmanê Iraqê dur bixînim.

- Li gorî belgeyek di destê me de di dawiya sala 1984 an li nexweşxanê razayê. Sedema razanê çi bû?

Weke ku min qal kir, di dawiya 1984 an de di tatbîqatekî leşkerî de agir bi balafira min ket û di dema xwe avêtinê laşê min şewitî û ez pir êşiyam. Dema paraşuta min gihîşte erdê ez ji ser hişê xwe çûbûm, xwîn ji serê min dihat, piştê min dihêşiya, destê min yê rastê şikestibû, hestû xwar bûbûn. Bi qasî 5 saetan li erdê mam. Paşê helîkopterê ez peyde kirim û birim nexweşxaneyê Musilê. Nig û destê min yê rastê bi alîkariya metal û birxoyan serastkirin. Parsû û stuna piştê min êşiyabû. Doktorê min, weke di raporê de jî xuyanî dike, ez weke nexweşek giran dame nîşandan. Piştî 10 rojên din, li nexweşxaneyê Al Baitar hatim razandin. Li wir nexweşên rewşa xwe xirap têne tedawîkirin. Mehekê di rewşek xirab de bûm. Paşê ez li nexweşxaneyê hêzên esmanî hatim bi cî kirin û ji bo kontrolê, ji mehê carekê diçûm Ibn al-Baitarê. Dawiyê li nexweşxaneyê Kerkûkê bi cî bûm û dest bi gymnastîkê kir. Tevayê sala 1985 li nexweşxanê derbas bû.

- Nexweşiyê ji awira meslekî ve çi bandorê li te kir?

Min, piştî buyera 1984, çî caran balafirên şer kar nehanî.

- Di salên 1985, 86, 87 an çî kar dane te?

Di dawiya sala 1985 an de ji bo ceribandina min, ji awira karanîna balafirên şer, sê caran laşê min ji aliyê tehemulê ve hate ceribandin. Piştî ceribandinan biryar hate girtin ku, ez nema nikarim xizmeta firandinê bi şeweyekî aktiv bi cî bînim. Belê, di sala 1995 an de, min tenê 2 saet û niv balafir bikar anî. Paşê di nivê sala 1986 de li dibistana Flying Intstrukturor, li balafirgeha Baxdayê ya Al Rasheed ê xebitîm.

- Ji serê salê hetanî gulana 1988 an bi çi karî dadiket? Navê serleşkerên te çi bûn?

Ez li kolêja Iraq Air Force instrukturê firandinê bûm. Rêvebirê komê Kahlid Mutlak Abdulhady bû. Paşê Muhamed Abdulatif bû rêvebir.

Hun dikarin li deftera min ya xebatê binêrin. Li wir eşkere xuyanî dike ku, di dema buyera Helebceyê de min qet balafir kar nehaniye. Ji bo me, di rojên bêhnvedanê, anku rojên sor de kar kirin û karanîna balafirê pêk nedihat.

Di dawiya 1995 an de ez hatim teqawîtkirin û min karê esmanî bi cî hişt.

- Li ser bombebarankirina Helebceyê zaniyariyên te çi qasî hene?

Cara ewil 1991 de qala Helebceyê hate kirin. Weke hun jî zanin Sansura Sadam Hisêyn pir hişk bû. Ji bo rejîma wî, sergirtin û ne eşkerekirina buyera Helebceyê jî pirsek giring bû.

Di dawiya Şerê Xelîcê, di 1991 de pêşmergeyan demek e kin Kerkûkê xistin bin kontrola xwe. Hinek dostên min yê kurd videoyên Helebceyê nîşanî min dabûn.

- Navên kesên suçdar yê buyera Helebceyê tê bîra te?

Emir bi giştî ji du deveran navendên leşkerî derdive:

Beşa şerê esmanî, ku erdê kontrol dikin, êrîşê dibin ser wan û bomberan dikin.

Beşa parastinê, ku ji radara pêk tê, êrîşan û SAM misîlan kontrol dikin.

Herdu jî ji aliyê artêşa giştî tînin kontrol kirin. Saddam jî rêvebirê wan bû.

Pirsa te li ser eşkerekirina navê kesên suçdar be, ez bi xwe jî nizanim navê wan. Ji ber ku li kolêjê instruktur bûm û çi eleqata min bi operasyonên leşkerî tunebû. Lê navê wan li hinek deveran hene û peydekirina navên wan ne karekî dijwar e.

- Pîlotên şer piştî operasyonan raporên dinivîsin an na?

Belê, pîlotên şer û yê casustiyê ji bo operasyonên nû ferman/ emirên xwe bi nivîskî distînin. Piştî operasyonê jî, bi xwe raporekê dinivîsin û teslîmî rêvebiriya xwe dikin. Lê pîlotên seyidvan çi emîrên bi nivîskî nastînin. Dema ku balafirên neyaran dixînin erdê, raporên dinivîsin.

- Gelo raporên operasyonên li dijî Helebceyê îro peyde dibin? Mirov çawa dikare wan peyde bike?

Ez bi xwe nikarim bersiva vê pirsê bidim. Lê dikarim dîtina xwe bînim. Ez pir kêfxweş im ku, min deftera xwe pîlotiyê parast û belgeyên xwe hilandin. Lê hinek pîlot dikarin di vî alî de weke min ne bi şens bin.

Belê, di rewşa normal de, serleşkeriya rêvebir raporên wisa diparêzin. Lê îro ew rapor hene, an jî wunda ne, mirov nikare tiştekî bêje.

- Li gorî Asayîşê tu pîlotê şerî û ji qirkirina Helebceyê suçdar e. Dîtina te çi ye?

Ez demekê pîlotê seyidvan bûm. Min bi dirêjî qala çîroka xwe kir. Di sala 1984 an xebata min ya aktîv bi dawî hat. Anku berî buyera Helebceyê bi 4 salan tîkiliya min bi firandina aktîv re nemabû.

Di qirkirina Helebceyê de rola min tune ye, ez bê guneh im. Îdîyên tene gotin tev derew in. Asayîş jî zane ku ez bê suc im. Min, bêsucbûna xwe belge û dokumentan ispat kir.

Ez ji hepê nereviya me û bi fermana Serekomar Talebanî hatime berdan.

Piştî derketina min hepsê, di hinek raporana de qala reva min ji hepsê hatiye kirin. Paşê jî nûçeya berdana min bi emirê Serok Talebanî belav bû. Lê destnivîsa rêvebirê Asayîşê Saif al Den bi xwe heye ku, ez hatime berdan.

- Serok Talebanî li ser pirsê çima bê deng e?

Daxwaziya min ji Serokomar Talebanî ew e ku, destê xwe deyne ser wijdanê xwe rastiyê li hemberî dadgehê bîne zimên, bersiva vê pirsê bide: Te Tariq Ramadan azad kiriye an na?

Asayîşê di bin mercê îşkencê û bi zorê îfadeya pejirandina qirkirinê bi min daye îmzekirin. Ji bilî belgeyên wisa sexte û ne di cî de pê ve, di destê wan de dokument tune ye.

Beş 3: Îdîa

- Li gorî Asayîşê tu di dema tedawiyê de ji hepsê reviya ye. Tu dibêji Serokomar Talebanî emirê azadiya te daye. Ya rastî çi ye?

25 cotmeha 2007 an de ji zindana Kany Gomayê ez birim navenda Asayîşê. Rêvebirek ji yê Asayîşê ku navê wî Nasir bû, ji min daxwaz kir ku ez grêva birçîbûnê bi dawî bihênim. Lê min qebûl nekir. Ji bo rewşa min ya sihetê fêma bike, gazî doktorekî kir. Doktor ez muayene kirim û got ku rewşa min zêde ne baş e û divê ez xwarinê bixwim. Piştî berê min dane hepsê.

Piştî rojekî birayê min û lawê min hatin serdana min. Wan qal kir ku, Serokomar Talebanî bi xwe bi rêya telefonê ji Saif al-Den xwestiye ku min azad bike, berde. Lê min wê kêliyê ji wan bawer nekir.

28 mehê nobedarekî ez birim cem Hecî Jamal (sekreterê Seif el-Dan). Dema ez çûm daireya Saif, birayê min jî li wir bû. Saif el-Dan gote min: Pîroz be kak Tariq, Mam Celal biryar da ku te azad bike. Lê pêwîst e tu pora xwe kin bike, û şîr vexwe berî ji zindanê derkeve derve.

Min red kir, lê birayê min xwest ku mirov rêzdar be. Lewma min pora xwe kin kir. Min nasnameya xwe ji Seif xwest. Jê daxwaz kir ku, belgeya azadkirina min bide min ku ez bê suc im. Lê wî neda min.

Min zanîbû ku, law û biraziyên min li derve rawestiya ne, li benda min in. Min îcaze ji Saif xwest ku, ez û zarokan dema azadbûna xwe bi wêneyekê xatira bihêlin. Belê, ez rojnamevan bûm. Min zanîbû wêneyek dema azadiyê dê bibe belgeya herî mezin. Min wêne kişand. Paşê ez çûm eywana hepsê, min porê xwe kin kir, berê xwe da daireya Saif û pê re jî wêneyek kişand.

- Lê dîsa jî tu bi qirkirina Helebceyê tê suçdarî kirin û li te digerin. Tu xwe amade dibîne ku li dadgehê navnetewî pirsê eşkere bikî, rastiyê bîne zimên?

Divê ez bînim zimên ku, em naxwazin bibin biyanî. Em dixwazin li Iraqê bijîn. Piştî derketina hepsê, ez hatim malê. Siheta min baştir bû û min jî mîna tevahiye dest bi kar kir. Min wisa fêma kir ku, Serok Talebanî ez azad kirime ji ber ku ez bê suc bûm. Îdîayên li dijî min tev qels bûbûn û çî sedem ji bo suçdarîkirina min nema bûn. Lê dema nuçeya bazadana hepsê û gera li min belav bû, ez jî şok bûm.

Ez dixwazim bi kêfxweşî di dadgehek navnetewî bême mehkeme kirin, li wir belgeyên xwe pêşkêş bikim û îşkenceyên Asayîşê bînime zimên.

Derewên têne kirin bandorê li min û malbata min dike. Ez bi qirkirina gelan tême suçdarîkirin. Ji vê êşê mezintir çî tiştê din nabe. Dadgehkirina min ji aliyê mehkemeyek navnetewî, daxwaziya min ya herî mezin e. Lê ji bo pejirandina dadgehek wisa divê daxwazyên min jî li ber çava bêne girtin:

- Divê min bi rêya zorê teslîmî Iraqê nekin û me neşînin Iraqê
- Divê ez û malbata xwe li hemberî xeteran bêne parastin
- Mecal bê dayîn ku ez di heman demê de zaniyirê li ser îşkenceya li zindanan ku bi destê Asayîşê dibe bînime ziman, ku ji vê îşkencê Hikumeta Herêma û ya Iraqê jî mesul e.
- Mafê min yê parastinê ji awira ewuqatan hebe...

- Mesaja te ji bo Kurdên Helebceyê ku heskiriyên xwe wunda kirine, çi ye?

Ji kurahiya dilê xwe hez kirina xwe dihênim zimên. Peyv têr nake ku brînên wan derman bike. Ez nikarim alîkariyekî ji pêşkêş bikim ku, êşên hene hinekî sivik bikim. Xelkê Helebceyê rastiyê ji hemu kesan bêhtir dibînin, nas dikin. Xwestin û bicîanîna edelatê mafê wan e.

Ez dixwazim ji tevayê Iraqê û cîhanê re bînime zimên ku, qirkirina Helebceyê suçêk pir xirab û hovîtiyek mezin e. Divê kesên suçdar piştî lêkolînên kur bêne peydekirin, dadgehkirin û bi hişkî bêne cezekirin. Kirinek wisa ji bo xelkê Helebceyê û tevayê Iraqê pir giring e.

Em tev ji aliyê polîtîkerên bertîlxwar, serok û Asayîşê ve têne xapandin û trajediya Helebceyê ji wan re bûye navgîn ji bo armancên wan. Bi rêya wê xirabiyên xwe diveşêr in. Li ser navê şehîdên Helebceyê, ev kirin kêmasiyek mezin e.

Divê kesên suçdar û îşkencekar bi heman helwestê bêne cezekirin...

EuroKurd Human Rights-EHR

EuroKurd Human Rights dezgehek însanî ye û li ser pirsê mafê mirovan li Kurdistanê dixebite. Dezgeh bi çî hêz û îdeolojiyan ve ne girêdayî ye, ji awira aborî ve serbixwe ye. Xebata xwe li ser bingeha rojnamevaniya lêkolînî pêk dihêne û pirsê mafê mirovan li ser esasê qanûn û peymanên navnetewî dişopîne.

EuroKurd rapor û nûçeyên li ser pirsê berhev dike û yê giring werdigerîne kurdî. Paşê ji bo ronîkirina raya giştî bi rêya malpera xwe belav dike.

EuroKurd bi dezgehên navnetewî /netewî yê însanî re têkiliyan datîne.

Zarathustra News ji bo berhevkirina nûçeyên li ser pirsê, di xizmeta EuroKurd Human Rights ê de ye. www.eurokurd.net li ser bingeha armancên EuroKurd ê weşana xwe dike. Naveroka malperê giraniya xwe li ser pirsên mafê mirovan li Kurdistanê û ewlekariyê ye.

Bi silavên dostanî û biratîyê
EuroKurd Human Rights
Stockholm

Organisation: EuroKurd Human Rights – EHR
News Service: Zarathustra News
Home page: www.eurokurd.net
E- mail: zarathustra-news@comhem.se